Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :406 nameronahi@gmail.com 5- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Li ser çiya dikim qêrîn; "KEKÊ EZ LI VIR IM"





Xwişka fermandar Nûman Amed, Delîla ku sala 2013'an piştî şehadeta kekê xwe tevlî nava refên gerîla bû got, "Min kekê xwe qet nedît, lê mîna ku timî bi min re bû. Ji ser serê çiyê dikim qîrîn; Keko ez li vir im!"

Li gel astengî û derewên dijmin jî ciwan mîna çemekî ber bi cewhera xwe ve diherikin. Delîla yek ji hezaran gerîla ye ku ji bo bersivê bide zilma dijmin û tola şehîdan hilîne berê xwe daye çiyê. Delîla sala 1995'an li Amedê ji dayik bû. Di nava 12 xwişk û bira de ya herî biçûk e. Dema ku ji dayik bû, kekê wê Nûman li nava refên têkoşîna azadiyê bû. Bi bîranînên wî mezin bû. Xewn û xeyala wê bû ku rojekê li cihekî hev bibînin. Piştî şehadeta kekê xwe fermandar Nûman Amed ku têkoşîna wî ya li çiyayên Amedê her li ser zimanan e, biryar da ku tevlî nava refên azadiyê bibe. Dema ku wêneyên kekê wê sala 2006'an digihêje malbatê, yekî ji nav derdixîne û ji xwe re vedişêre. Wêneyê Nûman Amed ê dev li ken hîn pê re ye. Delîla dibêje, "Di wêneyan de kenekî welê xweş dike, mîna ku bang li mirovan dike."

### DIÊŞIYAM LÊ SERBILIND BÛM

Delîla kekê xwe ji dûr ve şopand. Heta 31'ê Kanûna 2012'an dema agahiya wî ya şehadetê ji wan re hat ku nedixwestin bawer bike. Delîla dibêje, "Berê jî dijmin li ser kekê min nûçeyên şehadetê diweşand. Me jî digot belkî yek ji wan nûçeyan e, me bawer nekir, lê vê carê rast bû. Piştî ku agahî gihîşt me, em çûn Amedê. Bi rojan em li wê derê mijûl kirin û piştre kekê min dan me. Nedihat bîra min ku ez ê kekê xwe, lehengê zarokatiya xwe bi vî rengî bibînim. Dibe ku tiştekî ecêb be, lê eşqa min a zarokatiyê bû. Di dema zarokatiyê de gava hevalên min digotin, 'ez evîdar bûme' min jî ji xwe re digot 'eşqa min kekê min e'. Ez ê biçûma çiyayê Amedê û mîna hevrêyeke wî ya ciwan derketibûma pêşiya wî. Aliyekî min serbilind bû, lê aliyê din diêşiya.

### WEKE KU TIMÎ LI CEM MIN BÛ

Min kekê xwe qet nedît, lê weke ku timî li cem min bû. Naskirî bû. Ya rast, berî ku ew şehîd bikeve ez gelekî bê sebir bûm ku biçim cem wî. Dayika min felç bû, ji ber ku zaroka dawî ya li malê ma ez bûm, ez li bendê mam ku wextek di ser şehadeta kekê min re derbas bibe. Piştî salekê min berê xwe da çiyayên ku hebûna kekê xwe lê hîs dikim. Min ji hevrêyên wî guhdarî kir bê mirovekî çawa dilnizm bû. Min jî xwest bibin beşek ji vê çîrokê, ne tenê lê guhdarî bikim.

Delîla dema hat çiyê çû cihê ku Nûman û hevrêyên wî lê şehîd bûn. Çû stargeha ku lê dima, pirtûka wî ya 'Dayik' Maksîm Gorkî ku gelekî jê hez dikir dît. Û ferek pêlava wî dît. Hevrêyên wî kefiyeya wî dan wê. Dest bi nivîsandina helbest û nivîsan kir li ser kekê xwe.




Di dawiyê de qala çîroka navê xwe dike: "Gelekî fikirîm bê navê kekê xwe rakim an na. Gelo min ê karîbûya mîrateya wî ya giran hilbigirta. Dema hatim çiyê min dît ku gelek hevrêyan navê Nûman Amed li xwe kirine. Min biryar da ku navê kekê xwe rakim. Dibe ku ew nizanin, lê belê hebûna wan hêzê dide min. Hêrsa min a li dijî dijmin gelekî mezin bû û min zanîbû ku dikarim li çiyê tola xwe hilînim. Dixwazim li vê derê bibim bersiv ji keda hevrêyan. Li ser serê çiyayên bilind diqîrim: Keko ez li vir im!"... ***Ûmût ŞERZAN***



## KA BIHA YE, dest bi çandina giya kirin





Li Wanê ji ber ku kîloya kayê bûye lîre û nîv, sewalvan ji bo heywanên xwe xweyî bikin dest bi dirûtina giya kirin.

Li Wanê û navçeyên wê, ji bo heywananên xwe sewalvanan dest bi dirûtina giya kir. Ji ber ku kîloya kayê bûye lîre û nîv, welatî hewl didin ku bi giyayê ku didirûn heywanên xwe xweyî bikin.

Şêniyên gundê Farixê yê girêdayî navçeya Rêya Armûşê ya Wanê, li quntarên Çiyayê Erekê dest bi dirûtina giya kirin. Jin û mêr tevde giyayê ku didirûn dikin qevd.

Îbrahîm Kiymaz, anî ziman ku kîloya kayê pir biha bûye. Kiymaz, bilêv kir ku wî ji bo heywanên xwe 10 donim giya daniye. Kiymaz diyar kir ku ew di Adar-Nîsanê de giya datînin, di Hezîran-Tîrmehê de jî diçinin. Kiymaz, da zanîn ku 20 dewarên wî hene û got: "Em zivistanê kayê ji Riha, Mêrdîn û Êlihê dikirrin. Zivistanê kîloya kayê dibe lîre û nîv. Ev der 10 donime, em datînin lê ancax hefteyê têra heywanên me dike. Li cihê ku ka biha be, sewalvanî anyê kirin. Lîtreya mazotê bûye 6 lîre, perçeyekî bîçerê 150 lîre ye. Em van giyayan davêjin patosê, dikin ka û paşê kapekê tev li nav dikin. Em dixwazin fiyetên ka û mazotê kêm bibin." dedi.





Kiymaz, diyar kir ku fiyetê ka û mazotê tim biha dibe û got: "Ev der ziwa ye. Serê salê çi qas giha bi dest bikeve ew e. Em cara duduyan tu tiştî ji vî giyayî bi dest naxin. Karekî zehmet e, lê wekî din tu çareyek me tune ye."

## Ji bo Kurdan tişta pêwîst yekîtî ye



### GELAN FAŞÎZM TÊK BIR

Hevseroka Kongra Gel Hacer Zagros diyar kir ku rêjîma faşîst ya AKP-MHP'ê di hilbijartinên 24'ê Hezîranê de li hember hêzên demokrasiyê yên di bin pêşengiya HDP'ê de têk çûye. Zagroz wiha got, "Gelan rêjîma Erdogan-Bahçelî ya faşîst û nijadperest di sandoqan de têk birin. Lê berjewendiyên hêzên hegomonîk ew li ser desthilatê girtin."

### BILA PDK HELWESTA XWE ZELAL BIKE

Hacer zagros têkildarî rewşa Efrînê û yekîtiya netewî jî ev nirxandin kir, "Piştî dagirkirina Efrînê di navbera hêzên herêmî û hegamonîk de nakokiyên kûr rû dane. Dibe ku piştî Îranê Tirkiye jî li Sûriyê were bê bandor kirin." Hacer Zagros diyar kir ku li hember êrîşan ji bo Kurdan yekîtîya netewî pêwîstiyeke jiyanî û da zanîn ku divê PDK jî helwesta xwe zelal bike. *R-4*

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 406 5- Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

### Dem dema xebatê ye



*Tayîp TEMEL* *R-4*

# GELO LI BAŞÛR KÎ DAGIRKER E?

### PDK TIRKIYÊ WEKE DAGIRKER NABÎNE

PDK û Berzanî dîsa di vê demê de li gor dîroka xwe ya bê oxir û dij berjewendiyên gelê Kurd tevdigere. Tevî ku dewleta Tirk her roj êrîşî başûrê Kurdistanê dike û sivîlan qetil dike û her wiha dixwaze xaka başûr dagir bike lê PDK ti helwestekê nîşan nade û heta rê li ber vedike.

### BAŞÛR TÊ BOMBEBARAN KIRIN

Dewleta Tirk ya dagirker li başûr, bakur û rojava li dijî destketiyên kurdan bi her awayî êrîşan pêk tîne. Ev mehane artêşa Tirk êrîşî başûr dike û gund û çiyayên başûr bombebaran dike. Hewl dide hin herêmên başûr dagir bike û xwe lê bi cih bike.

### BERXÊ ŞÎRÎ HETA PÎRÎ

Serokwezîrê başûrê Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî ku serokê rêjîma Tirk Erdoganê faşîst ji ber hilbijartinan pîroz kir, PKK jî weke dagirker bi nav kir. Nêçîrvan got, "PKK'ê beşeke mezin a Herêma Kurdistanê dagir kiriye û ji vê derê êrîşê dibe ser Tirkiyê. *R-5*



## Li Şehbayê civînên bi gel re bi dawî bûn



Delegeyên Konferansa Rizgarkirina Efrînê ku civînên ku encamên konferansê ji gel re parvedikirin bi dawî kirin. Di civîna dawî ya li Fafînê de Hevserokê Meclîsa kantona Efrînê Mustefa Hesen axivî û got: ″Em Efrînê ji dewleta Tirk û çeteyên wê re nahêlin û têkoşîna me ya rizgarkirina Efrînê didome.″ *R-5*

## Dijminatiya AKP'ê Leyla û Eylul da kuştin



Meclîsa Jinan a HDP'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku polîtîkayên AKP'ê yên dijminatiya li jin û zarokan, Leyla û Eylul dan kuştin. Jinên HDP'yî wiha gotin, "Divê tundî û îstîsmara li ser zarokan weke mijareke ser partiyan re bê destgirtin û ji bo peydakirina çareseriyeke ku hemû beşên civak bê tevlîkirin, xebat bên meşandin. *R-3*

## Bi hezaran jin li Xezzayê daketin qadan

Li Filistînê Xezayê, di çarçoveya çalakiyan de ku çend meh in dewam dikin, yekem car bi hezaran jin tevî zarokên xwe tevlî çalakiya li herêma sînor ê navbera Xeza û Îsraîlê bûn. Jinan dorpêçiya Îsraîlê şermezar kirin. Di dema xwepêşandanê de hêzên ewlekariyê yên Îsraîlê dest li çalakgeran werdan û herî kêm 17 kes birîndar bûn. *R-3*

## Xetereya bi darvekirina Ramîn hê didome



Siyasetmedarê kurd Ramin Huseyin Penahî ku rastî cezayê îdamê hatiye, dibe ku her kêlî wî darve bikin. Parêzerê Penahî Huseyin Ehmedi Niyaz, diyar kir ku di nava gel û civakê de hassasiyetek mezin çêbû, lê dîsa rîska îdama Penahî didome. *R-4*

## KENY ji bo başûrê rojava yê Sûriyê dicive



Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî ku li hember dagirkirina Efrînê û koçberkirina gel ya bi darê zorê dengê xwe dernexist û dernaxe wê îro bi ro bi rojeva şerê li başûr-rojavayê Sûriyê bicive. Ev civîn li ser daxwaza Swêd û Kuweytê pêk tê. *R-4*

## aqubeta mirovên tên revandin nayê zanîn



Piştî ku dewleta Tirk û çeteyên wê Efrîn dagirkirin êrîş û kiryarên hovane li dijî gel didomînin. Dewleta Tirk û çeteyên wê sivîlan direvînin, êşkence li wan dikin, dest li ser mal û milkên Efrîniyan datînin. Li herêmê ku xesp û talan lê serdest e, aqûbeta bi sedan kesî nayê zanîn. Hat ragihandin ku dagirker 12 sivîlên din jî li navçeya Mabata revandin. *R-5*

## Çalakvana Kurd radestî dewleta Tirk hat kirin



Siyasetmedara Kurd Gulîzar Taşdemîr ku ji bo penaberiya siyasî serî li Norwêcê dabû û derman dibû, radestî Tirkiyê hate kirin. Gulîzar Taşdemîr ku nêzî 27 salan di nava têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd de bi awayekî çalak cih girt, 7'ê Hezîrana 2015'an li Norwêcê ji bo penaberiya siyasî serlêdan kiribû. *R-5*

## Piştgirî ji bo azadiya Ocalan mezin dibe



Çalakiyên piştgiriyê ji bo azadiya rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan mezin dibin. Gelek rêxistin piştgiriyê didin çalakiyan. Sendîkaya PROSPECT a Îngilîstanê ku zanyar, hunermend û endezyar endamên wê ne û hêjmara endamên wê 83 hezar e, tevlî kampanya ji bo azadiya Ocalan bû. Ji aliyê din ve mezintirîn festîvala karkeran a cîhanê "Durham Miners Gala" ku 14-16'ê Tîrmehê de wê bê kirin, diyarî Ocalan hate kirin. *R-5*

## HPG'ê li leşkerên Tirk ên dagirker xist



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand, êvara 3'ê Tîrmehê saet 18:00'an li herêma Biradostê ya Sîdekan a Başûrê Kurdistanê li leşkerên artêşa Tirk ên li ser girê Lêlîkanê hatiye xistin. Di daxuyaniyê de hate gotin, derbên giran li çeperên leşkeran hatin xistin, lê hejmara leşkerên mirî û birîndar nehatiye zelalkirin. *R-2*

## Li dijî şaneyên DAIŞ'ê operasyon hat destpêkirin *R-2*


# Aqubeta mirovên tên revandin nayê zanîn

**_Piştî ku dewleta Tirk û çeteyên wê Efrîn dagirkirin êrîş û kiryarên hovane li dijî gel didomînin. Dewleta Tirk û çeteyên wê sivîlan direvînin, êşkence li wan dikin, dest li ser mal û milkên Efrîniyan datînin. Li herêmê ku xesp û talan lê serdest e, aqûbeta bi sedan kesî nayê zanîn. Hat ragihandin ku dagirker 12 sivîlên din jî li navçeya Mabata revandin._**



Hêzên dagirker ên Tirk û çeteyên wê li gundê Efrînê 12 kes revandin.
Hat ragihandin ku li navçeya Mebata, Tabûra El Cebaha û El Şamiye Sêşemê li gundê Mîrkanê 12 sivîl revandine.
Navê sivîlên ku hatine revandin wiha ne:
Şikrî Mihemed Kinc Xemîs (55), Henîf Mehmûd Mistefa (60), Xelîl Hisnî Hemdî (43), Mihemed Xelîl Nûrî (49), Rifet Izet Sînot (40), Reşîd Ebdo Şêxo (45), Hikmet Kinc Xemîs (58), Misefa Ehmed Silêman (56) ve Mihemed Hisên Hemalîko (48) ile oğulları Hisên Hemalîko (20) ve Xemgîn Hemalîko (18).
Hat ragihandin ku ji bo Ehmed Henan (27) were berdan, ku beriya bi 2 mehan hatibû revandin, 3 hezar dolar fîdye xwestine, li gel ku pere dane jî hê aqûbeta wî ne diyar e.
Ji 20'ê Çile ve, ku êrîşên dagirker ên ser Efrîn des pê kirin û heta niha êrîşên ser gle didomin. Dewleta Tirk û çeteyên wê sivîlan direvînin, êşkence li wan dikin, dest li ser mal û milkên Efrîniyan datînin. Li herêmê ku xesp û talan lê serdest e, aqûbeta bi sedan kesî nayê zanîn…*ANHA*

## *HPG'ê li leşkerên Tirk ên dagirker xist*



HPG'ê diyar kir ku li herêma Bradostê ya Başûrê Kurdistanê li dijî leşkerên li ser girê Lêlîkanê çalakiyek hatiye kirin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand, êvara 3'ê Tîrmehê saet 18:00'an li herêma Bradostê ya Sîdekan a Başûrê Kurdistanê li leşkerên artêşa Tirk ên li ser girê Lêlîkanê hatiye xistin.Di daxuyaniyê de hate gotin, derbên giran li çeperên leşkeran hatin xistin, lê hejmara leşkerên mirî û birîndar nehatiye zelalkirin.Navendê di dewama daxuyaniay xwe de li ser bomberdûmana balafirên şer ên artêşa Tirk jî agahî da.Li gorî daxuyaniyê, 3'ê Tîrmehê saet navbera 14:00-14:30'î, balafirên şer ên artêşa Tirk bombe li herêma Basya ya navçeya Şemzînan a Colemêrgê barandin.Şeva heman rojê saet 23:50'î jî balafirên şer ên artêşa Tirk bombe li geliyê Aris-Faris ê li herêma Avaşînê ya li Herêmên Parastinê yên Medyayê barandin.Navendê diyar kir ku ji ber bomberdûmana bi balafiran tiştek bi hêzên wan ên gerîla nehatiye.

## *Kurr hat kuştin, dor hate bav*





Nûnerên DAIŞ'ê ragihand ku kurê rêberê wan Ebû Bekir El-Bexdadî li parêzgeha Hums a Sûriyê hatiye kuştin.
Li gorî Ajansa Emaq a girêdayî DAIŞ'ê bi rêya Telegraf li ser koma navê "Wîlayeta Hums" a DAIŞ'ê wêneyekî kurê Ebû Bekir El-Bexdadî yê bi navê Hideyfa El-Bedrî ku cilên afganî li xwe dikirin û kelêş di dest de, weşand.
Bi wêne re jî daxuyaniyek belav kirin û gotin ku kurê Ebû Bekir El-Bexdadî di êrîşa li dijî alîgirên rêjîmê û Rûsyayê de ku li stasyona germahiyê ya wîlayeta Humsê pêk hat, hate kuştin. Ebû Bekir El-Bexdadî ku Washington 25 milyon dolar ji yên cihê wî aşkera bike yan wî bikuje re diyar kiriye, tenê carekê dema "Dewleta Xîlafetê" ragihand derket.
Tê gotin ku 4 kurên El-Bexdadî ji hevjîna wî ya yekem hene û kurek jî ji hevjîna wî ya duyemîn heye.

## Mîlyonek 200 hezar kesî koç kir



Li Etîyopya ku gelek komên etnîk lê dijîn ji Nîsanê ve ji ber bûyerên tundiyê li başûrê welêt 1.2 milyon kes neçar ma ku cihê xwe biguherîne. Şer Nîsanê 400 kîlometre li başûrê paytextê Addîs-Abeba gur bû.Li gorî rapora NY'yê, ji Nîsanê ve 1.2 milyon kesî malên xwe berdane. Tenê ji Hezîranê ve nêzî 800 hezar kesî malên xwe berdane.
Di raporê de hate gotin, ''Bûyerên tundiyê ku ji Hezîranê ve li qadên Gedeo û Gujiya Rojava ya li Oromîa didomin, bû sedem ku ji Gedeo 642 hezar û 152 kes, ji Gujiyê jî 176 hezar û 98 kes birevin.''
Etîyopya ya bi nifûsa 100 milyonî xwedî nasnameyeke rengîn e. Ji ber şer Sewokwezîr Haîlemarîam Desalegn Sibatê neçar ma ku îstîfa bike. Abîy Ahmed ku Nîsanê hate ser kar soz da ku ji bo şer raweste reformên siyasî û aborî bike. Lê Ahmed heta niha nekarî ku bûyerên tundiyê bisekinîne.

## Li Efrînê dagirker bi hev ketine



Hate ragihandin ku di navbera artêşa Tirk a dagirker û çeteyên koma "Lîwa El-Hemzat" şer derket. Şer piştî ku çeteyên "Lîwa El-Hemzat" qebûl nekirin ji bajêr derkevin û biçin navçeyan rû da. Li gorî agahiyên ku çavkaniyan ji kantona Efrînê dane, du roj berê di navbera artêşa Tirk a dagirker û çeteyên koma "Lîwa El-Hemzat" şer derket, giraniya şer li deriyê ketina bajarê li ser riya kolana Fîl e bû.
Çavkaniyan destnîşan kir ku artêşa Tirk a dagirker nuqteyên "Lîwa El-Hemzat" ên li nêzî nexweşxaneya Dêrsim û gundê Tirindê topbaran kirin. Li gorî çavkaniyan; artêşa Tirk ji çeteyên "Lîwa El-Hemzat " xwest ku ji Efrînê derkevin û biçin navçeyan, piştî çeteyan qebûl nekirin derkevin şer derket.
Çavkaniyan dane zanîn ku artêşa Tirk a dagirker ji taxa Mehmûdiyê nexweşxaneya Dêrsim û ji dibistana Salih El-Elî ya li taxa Eşrefiyê derdora gundê Tirindê topbaran kirin…*ANHA*

## Li dijî şaneyên DAIŞ'ê operasyon hat destpêkirin

Hêzên Iraqê bi piştgiriya Hêzên Pêşmergeyan li dijî şaneyên DAIŞ'ê operasyoneke berfireh dan destpêkirin.
Berdevkê Ragihandina Ewlekariya Iraqê Yehya Resûl derbarê operasyonê de daxuyanî da û got, "Operasoyon bi navê 'Tola Şehîdan' hatiye destpêkirin û bi rêveberî û koordîneya Fermandariya Çalakiyên Hevbeş ku ji artêşa Iraq, Polîsên Federal, Destwerdana Lezgîn, Polîsên Selehedîn û Diyala, Hêzên Pêşmerge û Hêzên Koalîsyona Navdewletî pêk tê, wê bi rêve biçe." Resûl destnîşan kir ku armanca operasyonê paqijkirina herêmên rojhilatê riya Diyala-Kerkûk e."
Operasyon wekî bersivdayîna qetilkirina dîlgirtiyên ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve ku di hefteya derbasbûyî de cenazeyên wan li ser riya Bexda-Kerkûkê hatiye destpêkirin e.



# Çand bi jinan tê parastin û pêşxistin

**_Yekemîn parazvana çandê jin in. Di destpêka şaristiniyê de ji bo pêşxistina jiyana hevpar û çandê jin bi roleke sereke rabuye. Vê rola xwe ya roja îro jî didomîne. Di jiyana mirovahiyê de destar amûrekî girîng yê jiyanî ye. Jina bi navê Nahîde Daban ya ji Kobanê ku niha li Til Temir rûniştiye bikaranîna destar çanda kenveşop didomîne._**



Jinên kurd çanda xwe ji windabûnê diparêzin. Ji wan jinên ku çanda xwe diparêzin yek jî Nahîde Daban e ku heta niha destar bi kar tîne. Nahîde wiha dibêje, "Di tevahiya dîrokê de yên ku herî zêde çanda xwe parastin û lê xwedî derketine jin in û divê ku ji îro û pêde jî vê çanda xwe biparêzin." Wekî li her derê li Rojavayê Kurdistanê ji dîrokê û heta niha jin parastina alavên dîrokî yên wekî destar dikin ku destar çanda herî kevnar a ku jinan heta roja îro parastiye. Her çiqas alavên pêşketî jî derketibin lê jin her dem bi armanca ku vê çanda xwe biparêzin, nîsk, genim û hwd. ku pêdiviya wan pê hebe bi destar dihêrin.
Nehîde Daban a 45 salî ku bi eslê xwe ji bajarê Kobanê ye û li bajarê Tiltemrê yê herêma Cizîrê dijî heya vê kêliyê jî destar bikartîne. Nahîde sedema bi karanîna destar wiha vedibêje: "Jin xwedî li çanda jinên afrîner ên dîroka kevnar derdikevin û ev çand heta roja îro anîne. Jinên kurd heta asta dawiyê li çanda xwe xwedî derketine û destar jî çandeke wan e."

### EZÊ ÇANDÊ BIPARÊZIM

Nehîde armanca xwe ya bikaranîna destar wiha vedibêje: "Destar xwezayî ye û tişta ku tu pê bihêrî xwezayîbûna xwe winda nake. Niha dema hêrandina nîsk û genim e ez nîskên xwe bi destar dihêrim. Ji ber ku tameke cûdatir dide mirovan û heta roja îro bi ked û parastina dayikên me heta roja îro hatiye. Ez naxwazim ku ev çand ji holê bê rakirin."Nehîde ya ku çanda gelê kurd a resen ji wêndabûnê diparêze wiha pêde çû: "Di her demsalê de ez destar bi kar tînin bi armanca ku ez vê çanda gelê kurd ji windabûnê biparêzim. Çiqas ku çand were parastin ewqasî jî dîrok tê mayîndekirin."
Nahîde bang li hemû jinan kir ku li çanda xwe xwedî derkevin û wiha dawî li axafitina xwe anî: "Divê jin xwedî li çanda xwe derkevin û bi taybet jî li çanda jinên afrîner ku hat roja îro ji berhemên wan sûdê digrin. Di çanda jinên afrîner de jiyaneke komînal jî heye. Dema ku jin ji bo karê hêranê li dora destar û her wekîdin amûrên dîrokî kom dibin çanda stranbêjiyê jî li wê derdikeve holê. Jinên ku li dora destar kom dibin li gorî ahenga dengê destar ku derdixe stranan jî dibêjin û çanda stranbêjiyê pêşve dibin. "…Songul ***ŞÊXO-TILTEMIR/ JINNEWS***

## *Çîrokek 2 hezar û 700 salî: Gola Rûsayê*




2 hezar û 700 sal in Wan ji ava Gola Rûsayê sûdê digire. Qiralê Ûrartûyê yê II. Rûsa li navsera çiyayên Kûh, Qazan û Erekê bi bendan Gola Rûsayê çêkiriye. Gola Rûsayê ku di navbera navçeya Payîzava û Qelqeliyê de ye, 2 hezar û 700 sal in bi ava xwe ji bo Wanê goleke bivê nevê ye. Qiralê Ûrartûyê yê II. Rûsa, bi bendan ev gola çêkiriye. Ji ber ku quling tên dora golê, navê Gola Qulingan jî lê hatiye kirin. Her wiha ji ber ku nêzî Taxa Keşîşê ye, jê re Gola Keşîşê jî tê gotin.

### LI NAVSERA ÇIYAYAN HAT ÇÊKIRIN

Gola Rûsa li navsera çiyayên Kûh, Qazan û Erekê ku di navbera navçeya Payîzava û Qelqeliyê de ne hatiye çêkirin. Ji ber ku li hêla wê ya rojava û bakurê rojava du bend hatine çêkirin bûye gol. Dema berfa ku zivistanê dibare û biharê dihele, ava ku kom dibe di bendan de xwe digihîne Gola Sîhkeyê ku li navenda Wanê ye. Her wiha ji bo ava ku di cihokeke teng de pêşiya wê hatiye girtin û kom dibe, bendek nû hatiye çêkirin. Bi vê bendê herikîna avê bi lez çêdibe û xwe digihîne navenda Wanê. Ev ava ku li quntarên Çiyayê Erekê kom dibe, herî dawî xwe digihîne Gola Sîhkeyê ya li navenda bajêr. Bi vê avê erd tên avdan.Ji bilî vê Gola Rûsayê bala turîstên xwecihî û biyanî tev de jî dikişîne. Quling, weredek, qaqlîbaz û gelek çivîkên din li dora vê golê kom dibin û ev yek bala wênekêşan jî dikişîne. Ji ber ku derdora golê qemirgeh e çivîk tên li dorê datînin. Her wiha li qeraxa golê kulîlkên reng rengî jî şîn tên û ev yek jî bala wênekêşan dikişîne…*Mujdat Can/MA*

## Standa pirtûkên Ocalan hat vekirin



Komîteya Hemleya Azadiya Ocalan a jinên Başûrê Kurdistanê bi şîara `Azadiya mirov, azadiya fikre` li Silêmaniyê standa firotina pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan danî.Komîteya Hemleya Azadiya Abdullah Ocalan ya jinên Başûrê Kurdistanê bi şîara `Azadiya mirov, azadiya fikre` li Silêmaniyê standa firotina pirtûkên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan danî.
Komîteya Hemleya Azadiya Rêber Apo ya jinên Başûrê Kurdistanê diyar kir ku ev pênc meh in ji bo azadiya Ocalan di nava xebatan de ne û yek ji van çalakiyan jî pêşangeha firotina pirtûkane. Stand piranî ji pirtûkên Ocalan pêk tê. Stand wê hefteyekê berdewam bike.Stand wê 3 rojan li Cadeya salim be û 4 rojên dawî jî li Parka Azadî ya silêmanî be...*ROJNEWS*

## Şêwekarên Kurd û Ereb di pêşengehekê de ne

Di pêşangeha '3. pêşengeha dîtina Silêmanî ji bo rewşenbîrî' de 52 şêwekarên Kurd û Ereb hatin gel hev. duh li Majidi Mall a bajarê Silêmanî '3. pêşengeha dîtina Silêmanî ji bo rewşenbîrî' hate vekirin. Di pêşangehê de 52 şêwekarên Kurd û Ereb hatin gel hev û pêşangeh wê 3 rojan berdewam bike.
Her wiha di pêşangehê de tabloyên şêwekarî û karên dest hatin pêşkêşkirin.
Pêşangeh her roj saet 11.00 vedibe heya saet 00.00 şev wê vekirî be…
*ROJNEWS*





### Çand û Huner Neynika Cîvakê ye

Rotînda YETKÎNER

Ji bo ku mijara me rast bê têgihştin, berî em ê li wêneya mezin a cîhanê binêrin. Lêkolînvan, dîrokzan, sosyolog û arkeologan nasandina civak, gel û netewan bi riya çand û hunera kû afirandine pîvandine û bi wî rengî dane nasîn. Yanî di civakê de ciqas zêr û zîv, pere û pol heye nanerin an jî şoreşek herî bi bandor pêkanîne jî ne pîvane. Divê civak guhertina gel çiqasî bi rêya çand û hunere hunandiye ew esase. Ji ber ku şoreşên siyasî her çiqas bi bandor, mezintir û bi dijwarî pêk were jî, ger civak bi çand û hunera nû a şoreşê neyê rêxistinkirin, ew şoreş bandora xwe bi tenê demek kurt dikare bidomîne.
Ji despêka jiyana mirov û heya roja îro mirovahî tim û dayîm bi afirandina hunerê, û bi riya pêşketinên zanyarî li ber xwe vekiriye. Çi dem di civakekê de huner bi erzanî, tenê ji bo zevq û hestên xeyalî hatiye hunandin, wê demê civak ketiye nava valahiyek mezin. Roja îro de em binerin li rewşa cîhana me, asta kû huner têdeye nîşan dide ku mirovahî çiqasî di nava valahiya kûr, bê armanc de maye û bi hestên xapînok hatiye pelçiqandin.
Li Kurdistanê ev çil sale şoreşek bê hempa bi kedê û cangorîtiyek mezin tê afirandin, ev li ber çavên cîhanê ye û tu kes, tu hêz êdî vê rastiyê nikare înkar bike. Ev şoreş bi tevger kirina rêber Apo û bi Tevgera Azadiyê hat afirandin û meşandin. Tevgera Azadiyê di cewhera xwe de rêxistinek hemdem, pêşketî û resen e, lê mixabin di qada çand û hunerê de vê bê hempa bûna xwe hê jî nekari daxe qada jiyana gel. Çima?
Li gor min sedema herî mezin ji sala 2000 şûnve, bi navê pirr rengî û her kesî himêzkirin re, ji prensîbên xwe yên esasî tawîz da. Bi taybetî li saziyên çand û huner de ji bo pêşketina arabesk (bi hestên derewîn û bi nebawerbûna zanisti sotandina hestên gel huner çêkirin) deriyê xwe vekir û ev bû sedema ku hêdî, hêdî huner a resen bihele.
Duyem, di peyam û axaftinên siyasî de her çiqas li dij derketina arbeskê û populîzmê be jî, di siyaset û qada çand û hunerê de deriyê populîzmê vekir.
Mînak; komen hunerî ên destpêka rêxistinê de hatin afirandin, di van salên dawî de gelek paş de man û tenê di nava van koman de hin kes bi riya arabesk û populîzmê derketin pêş û rêxistin jî bi rengek bê deng ma, heta em dikarin bêjin bû alîkar. Ev kesana bi takekesiya arabesk bûn mînak jî nivşên nû re MIXABIN. Ger rêber Apo di destên dijmin de dîl neba ez ne bawerim ku ev arabesk û populîzma vala ewqasî bi bandor biba di çand û hunera me de. Ger em dixwazin civaka me bi vê şoreşa bê hempa û cangoritiya bi hezaran şehîdan bê hûnandin, divê em bizvirin ser cewhera Tevgera Azadiyê. Divê em dev ji tavîzên piçûk berdin, ji bo ku çand û hunera resen pêşkeve plan û projên resen re derî vekin û wek peyam û axaftinên xwe yên siyasî de tînin ziman, deriyê xwe ji arbesk û populîzma kû ruhê civakê dikuje re bigrin.

# Çêkirina firinê li ber bidawîbûnê ye

**Xebatên pêşxistina projeyên aborî û debara jiyana welatiyan li rojavayê Kurdistanê berdewam dike. Ji bo welatiya li gor derfetan projeyên xebat û her wiha pêşwazîkirina pêdiviyên jiyanî yên rojane tên pêşxistin. Li Girkê Legê firineke nan ya ku wê rojê 12 ton nan derxîne tê amade kirin. Dest bi projeya çêkirina firinê hatiye kirin.**

Meclisa Malbatên Şehîdan a navçeya Girkê Legê bi hevkariya Yekitiya Kooperatîfan a kantona Cizîrê projeya "Firina Malbatên Şehîdan" bi lêçûneke 40 milyon lîrayên Sûriyê û bi rojane 12 ton nan wê derxîne.
Meclisa Malbatên Şehîdan a Girkê Legê bi hevkariya Yekitiya Kooperatîfan a Kantona Cizîrê projeya avakirina firineke otomatîk pêk tîne û tê payîn proje di demeke nêzîk de bi dawî bibe. Proje bi beşdarbûna 270 kesan pêk tê.
Projeya Firina Malbatên Şehîdan kooperatîfeke taybet a malbatên şehîdan ên navçeya Girkê Legê ye. Piştî ku lêkolînkirina projeyê ji aliyê Yekitiya Kooperatîfan ve hate bidawîkirin, kooperatîfê navên beşdaran qeyd kirin û hejmara wan gihaşt 270 kesan. Rêjeya malbatên şehîdan di kooperatîfê de bi qasî ji sedî 80 ye û ji sedî 20 jî ji welatiyên din re ye.
Niha proje tê payîn di demeke nêz de bi dawî bibe. Li gorî rêveberan Firinê lêçûna projeyê 40 milyon lîrayên Sûriyê ye û tê payîn ku rojane 12 ton nan derxe.
Armanca kooperatîfê xurtkirina aboriya xweser a malbatên şehîdan û peydakirina nan ji herêmê re ye
Rêveberên projeyê diyar kirin ku armanca sereke ya projeya kooperatîfa firina malbatên şehîdan ew e ku aboriya xweser a malbatên şehîdan xurt bike û nan ji herêmê re peyda bike.
Girêdayî mijarê endamê



rêveberiya projeyê Celhûd Mirhî diyar kir ku pêdiviya navçeya Girkê Legê bi firineke mezin heye da ku welatiyên herêmê karibin bi hêsanî nan peyda bikin…*ANHA*

## EW ROJ



**Vedat Aydin**

Farûk SAKIK

Sala 1990'an siyasedmedarên Kurdan hatin cem hev û bi navê HEP partiyek saz kirin. Hezîrana sala 1991'an jî Vedat Aydin wek serokê HEP'ê yê Amedê hat hilbijartin. JÎTEM'ê ji bo kuştina Vedat Aydin biryar dabû. Demek ji bo revandin û kuştina wî hin amadekarî destpêkiribûn. Dihat şopandin. Kontrgerîlla di 2 yê Tîrmehê de li dora mala wî di keşfê debûn. 2 roj piştî vê keşfê tîmek tê amadekirin û ev tîm wek polîs bi şev saet 23.45'an li ber deriyê Vedat Aydin bûn. Hevjîna wî Şukran Aydin derî vekir. "Min derî li wan vekir, min dît ku 3 kesin. Yek bêtêl di dest wî de û 2 kes ji bi çek bûn. Yê ku bêtêl di dest dabû min baş bala xwe dayê. Ev kes min di meş û mitîngan de dîtibû. Ji bo ku min digot ev Polîsên hîç guman di min de çênebûn. Ez derbasî hundir bûm min ji Vedat re got, têlefonî derek bike paşê derkeve. Got, na ji ofîsa siyasî hatine, di demek kurt de wê min berdin û ezê werim.Vedat Aydin, hevalek xwedî tecrûbe bû. Gelek caran hatibû girtin û berdan. Lê piştî ku ew birin ez ketim nav gumana". 6'ê Tîrmehê parêzer û rayedarên partiya HEP'ê ketin nav hewldanan û li Vedat Aydin geriyan. Serî li gelek meqamên fermî dan. Lê van saziyan hemû bersivek dida; "Vedat Aydin ne di binçavan de ye û di derbarê aqûbeta wî de di dest me de tu agahî tune ne"8'ê Tîrmehê agahiyek belav bû û dihat gotin ku li nêzikî Madenê cesedek hatiye dîtin. Malbat û hevalên Vedat Aydin berê xwe dane Madenê. Malbat teşhîs kir ku ev cesed, cesedê Vedat Aydine. Di encama otopsiyê de eşkere bu ku berî kuştinê îşkence lê hatiye kirin¬ û piştre bi 8 gulleyan hatiye qetilkirin. Endamê JÎTEM'ê îtirafkar Mûrad Demîr di doza kuştina Vedat Aydin de wiha behsa wê roja revandin û kuştinê dikir: "4'ê Tîrmehê Cem Ersever hat got, operasyon heye. Min, Hadî Çelîk, Îlhan Çelîk girt û em birêketin. Min got qey li herêmek çoldarî operasyon heye. Îsmet Yediyildiz û Cem Ersever dema gotin emê Vedat Aydin bigirin û lêpirsîn bikin, min texmîn kir ku dê wî bikujin. Hin îtirafkarên ku di nav wan de Hasan Adak, Îmanim û Bûlent hebûn em bi sê wesayitan çûn mala Vedat Aydin. Hasan Adak, Îmanim û Bûlent bi bêtêlan çûn Vedat ji mal girtin anîn û em ber bi Xarpêtê birêketin. Wesayita Cem Ersever di rê de ket pêşiya me û me ew şopand. 10 km mabû ku em bigîhijin Madenê, em ber bi çiya meşiyan. Ersever got, lêpirsîn bikin, ez ê berdestê sibehê vegerim. Me dest bi lêpirsînê kir. Wî digot " Hûn nikarin tu tiştek ji min bigirin. Ezê neaxivim" Îşkence hetanî sibehê dewam kir. Dema ku me dît neaxaftinê de israr dike, me ew bire Madenê cihek bêdeng, peya kir û li bin pirekê ew înfaz kir. Hasan Adak tetîk kişand."
EWROJ...
9'ê Tîrmehê ji aliyê HEP'ê ve, ji bo "merasîma cenaze" amadekarî hatin destpêkirin. Rojek berê ji gelek deveran mirov pêl bi pêl ber bi Amedê herikîn.10'ê Tîrmehê li Amedê hemû darebeyên dikanan girtî bûn. Li çend noqteyan mirov bi wesayitên xwe komdibûn û ji bo girtina cenaze karwanê wesayitan amade dikirin. Li aliyek din jî, çar aliyên bajêr ji aliyê polîs, esker û tîmên taybet ve hatibû dorpêçandin. Konvoya ku cenaze ji Madenê girtibû, ji 6 hezar wesayitan pêk dihat. Dema ku ev konvoy vegeriya û ket bajêr, bi girseya ku li Amedê kom bibûn, gihîştibû 100 hezarî. Serê konvoyê gihîştibû Gorristanê lê dawiya konvoyê hê jî li taxa Seyrantepeyê bû. Li Amedê serhildan hebû. Dema karwan gihîşte nêzî qereqola "Mardîn Kapi" hêzên dewletê yên mat mayî dest bi êrîşan kirin. Ji qereqolê û ji ser bircên bedenê, gel gullebaran dikirin. 20 deqîqe ev êrîş dewam kir. Di encam de ber deriyê qereqolê bibû gola xwînê. Mirî û birîndar hebûn. Kolanên Amedê bûbûn wek qada şer. Piştî ku cenaze hat definkirin, Fehmî Işiklar û Midûrê Emniyetê li ser belavbûna girseyê li hevkirin. Dema ev hevdîtin dewam dikir, li ser bedenan êrîşa duyem destpêkir. Ji bo ku aliyê goristanê û aliyê qereqolê hatibû girtin, mirovan ji neçarî xwe ji kendalan ve diavêtin jêr. Gelek kes ew şev li Baxçeyên Esfel şeva xwe derbaskirin. Di serhildana Amedê de hin kes bi çekan hatin kuştin, hin kes wendabûn û gelek kes jî birîndarbûn. Dora rojê Wezîrê Karê Hundir Abdûlkadîr Aksû di daxuyaniya xwe ya fermî de digot, 8 mirî û 30 birîndar hene. Lê li gor şahidan 30 kes hatibûn kuştin û bi sedan kes jî birîndar bibûn.
ÎROJ...
Piştî Vedat Aydin li Kurdistanê kûştinan destpêkir. Ev rêxistina ku dewletê avakiribû, her roj li kolanan kurd qetil dikirin. Îroj, dema desthilatdariya faşîzma AKP'ê ye. Îro jî wek salên 90'î êrişî siyasedmedarên kurdan dikin. Her çiqas îroj neyên kûştin jî, lê bi awayek din li derveyî siyasetê têne hiştin. Îro jî gelek siyasedmedarên kurdan di girtîgehan de ne û gelek wan ji ber pêla zilma vê faşîzmê welat terikandin.
Kurdan, Vedat Aydin wek yekemîn şehîdê demokrasiyê qebûl kirin. Her sal di salvegera vê rojê de, li ser gora wî ji aliyê hevalên wê ve tê bibîranîn.

## Kanalîzasyona herî dirêj tê çêkirin



Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan a Kantona Kobanê projeya bicihkirina xetên kanalîzasyonê li bajêr û gundewarên wê da destpêkirin.
Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan a Kantona Kobanê bi armanca avakirina avahiyekê li başûrê navenda bajarê Kobanê, di 10'ê Hezîrana borî de, projeya siwarkirina xetên kanalîzasyonê da destpêkirin. Proje ji Kolana 24 a rojhilatê taxa Botan heta gundê Termîk ê dikeve başûrê bajarê Kobanê bi dirêjahiya hezar û 200 metre, dest pê kir.
Li gorî rayedarên projeyê, di nava 24 saetan de bi dirêjahiya 500 metre borî hate danîn.
Karkerên projeyê destnîşan kir ku ji ber kêmderferan û xwaziya erdê, astengiyên dikişînin.
Her wiha ji bo rêgirtina li ber kombûna ava baranê ku dibe sedema lehiyan, dê 35 rogar jî werin çêkirin.
Li bajarê Kobanê di du mehên dawîn de baran bi dijwarî barî û lehî rabûn, di encamê de ziyanên mezin gihaştin malên welatiyan û di zarok jî xeniqîn…*ANHA*

## ZAROK li bexçeyê Emel dilşad in



Bexçeyê Emel ê Zarokan li Tebqayê xebatên xwe berdewam dike. Zarokên ku dê û bavên wan dixebitin, di baxçe de tên xwedîkirin û her wiha tên perwerdekirin.
Baxçeyê Emel ê Zarokan ê girêdayî Meclisa Jinan a Tebqayê di meha derbasbûyî de hate vekirin. Baxçe dikeve Taxa Yekem Tebqayê.
Armanca meclisê ji vekirina baxçeyê zarokan ew e ku zarokan li ser du qonaxan fêr bike.
Di qonaxa yekemîm de dê zarokên temenê wan di navbera 3-4 salî de xwedî bikin û ya duyemîn jî zarokên ji 5-6 salî fêr bikin.
Di qonaxa duyemîn de zarok fêrî tîp û hejmaran dibin da ku derbasî refa yekemîn bibin. Yek ji rêveberên Baxçeyê Emel Asya Reşo diyar kir ku şênî navên zarokên xwe di baxçe de qeyd dikin.
Asya destnîşan kir ku di baxçe de 8 mamosteyên xwedî tecrube û nêzî 57 zarok hene. Asya Reşo da zanîn ku ew bi awayekî zêde li zarokên temenê wan biçûk dimêzînin, ji ber ku pêwîstiya wan bi lênerînê heye…*ANHA*

## Şêx Misto çi dît û çi nedît




Mistefa Mihemed Hemîd 127 salî ye, yek ji kesên herî temenmezin di cîhanê de tê naskirin û li gundê xwe jiyana xwe didomîne.
Mistefa Mihemed Hemîd ku bi navê "Şêx Misto" tê nasîn, di sala 1891'an de ji dayîk bûye û 127 salî ye. Şêx Misto Ereb e û hê jî jiyana xwe li gundê El-Şehbê yê girêdayî navçeya Silûk a kantona Girê Spî li cem neviyên xwe didomîne.
Dîroka ji dayîkbûnê ya Şêx Misto di nasnameyê de 1905 e û temenê wî dibe 113 sal. Lê Şêx Misto dibêje ew 14 sal piçûk hatiye qeydkirin.
Şêx Misto li bajarê Riha yê bakurê Kurdistanê bi cih dibe û piştre ji aliyê osmaniyan ve di serdema Cemal Paşa de tê qewitandin û ji wê demê ve li gundê El-Şehbê yê rojhilatê navçeya Silûk a kantona Girê Spî bi cih bûye.
Şêx Misto di sala 1921'an de bi Yazî El-Ehmed re dizewice û 5 xort û 4 keçikan wan çêdibin û di sala 1955'an de jî bi Yazî El-Elî re dizewice û ji wê jî 4 xort û 4 keçikên wan çêdibin. Li gundê El-Şehbê dijîn û hevsera wî ya yekemîn 40 salî bi wî re dijî û ji ber nexweşiyekê diçe ser dilovaniya Xweda û hevsera wî ya duyemîn jî piştî hevsera yekemîn bi 10 salan, ew jî ji ber nexweşiyekê diçe ser dilovaniya Xwedê.
Şêx Misto yê tevî temenê dirêj hê jî tendurustiya wî baş e û têkoşîna xw ya jiyanê didomîne.
Şêx Misto bi rûkenî û henekên xwe tê nasîn û çîrok û bûyerên serdemên cuda ku bi serê wî re derbas bûye vedibêje.
Şêx Misto girêdayî serdema osmaniyan wiha dibêje: "Di serdema osmaniyan de min xebatên giran dikirin. Di wê demê de temenê min 15 salî bû û ez û malbata xwe li bajarê Rihayê dijiyan. Di sala 1915'an de ji ber hovîtiya desthilatdarên Osmaniyan em neçar man ji Rihayê birevin û namûsa xwe biparêzin. Me berê xwe da devera Silûk ku di wê demê de di bin serweriya koçeran de bû.Şêx Misto behsa bîranînên xwe yên çûna bajarê Helebê ji bo pêdiviyên xwe dike û dibêje ku di wê demê de tenê çend dikanên bazirganiyê hebûn û got ku ew 13 rojan bi hêştiran diçû û vedigeriya.Şêx Misto rewşên dijwar ên ji ber desthilatdariya gelek dewletên dagirker ên wekî Osmanî, Fransî û Îngilîz kişandine û diyar dike ku dema herî dijwar di jiyana wî de di dema Osmanî û Fransiyan bû. Şêx Misto da zanîn ku di serdema Osmaniyan de gelek welatî rastî îşkenceyên dijwar dihatin û her kesekî ku pîvanên Osmaniyan qebûl nekiribana dihatin êşkence kirin û kuştin…*ANHA*



# SARA, mafên jinan diparêz e

***Rêxistina Sara ji bo parastina mafên jinan xebat û têkoşîna xwe berdewam dike. Endama Rêxistina Sara Ya Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê, Fewziya Henîf diyar kir ku ji bo rizgarkirina jinan ew bi hemû rengî xebatên xwe dişopînin. Fewzîyeyê got, "Rêxistina Sara têkoşîna maf û azadiya jinan e."***

Endama Rêxistina Sara Ya Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê, Fewziya Henîf têkildarî xebatên saziyê got: "Ji bo em bikaribin jinan ji tundî û êrîşan rizgar bikin em ê bi hemû rengên cuda xebatên xwe bidomînin."
Rêxistina Sara Ya Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê ya Kantona Kobanê di sala 2015'an de hat vekirin û li dijî tundiya li ser jinê têdikoşe. Endama Rêxistina Sara ya li dijî tundiya li ser jinê, Fewziya Henîf diyar kir ku şikandina tundiya li ser jinê ji xwe re kirine armanc û got: "Armanca me ew e ku em hemû jinan hembêz bikin, ji tundiyê biparêzin û parastina li dijî neheqiyê hînî wan bikin."
Fewziyayê bal kişand ser derûniya jinan û wiha dewam kir: "Ji ber ku di civaka me de yên ku herî zêde rastî tundiyê tên jin û zarok in, di warê derûniyê de jî bandorên neyînî herî zêde li wan dibe. Loma me pêwistî bi beşa derûniyê jî dît. Di warê xebatên beşa derûniyê de jî em dixebitin. Lewra heta ku derûniya civakê ne baş be wê hemû tiştên din jî bi aweyekî bi rêk û pêk nemeşe. Ji bo tundiya her rengî ya li ser jinê em têdikoşin."

### SARA JI BO PARASTINA JIN E

Fewziyayê da zanîn ku Rêxistina Sara ji bo parastina mafê jinê dixebite û wiha pê de çû: "Em weke sazî hem bi pirsgirêkên jinan mijûl dibin hem jî bi perwerdekirina saziyan mijûl dibin. Di heman demê de di nava xebatên me de perwerdeya zimanê dayikê jî heye. Ji bo jin xwe nas bikin û bikaribin ku xwe bi rêxistinkirin bikin em panel, semîner, dewreyên perwerdeyê û civînan li dar dixin. Ev xebatana hem ji bo pêşketina jinê, hem jî ji bo pêşketina civakê gelekî girîng e."Fewziyayê herî dawî wiha got: "ji bo jin rastî tundiyê neyên divê em bibin yek û têbikoşin. Heta jin rizgar nebe wê civak jî rizgar nebe. Rêxistina Sara têkoşîna rizgarkirina jinê ye."…
***Nesrîn Mislim-JINNEWS/KOBANÊ***




## Ez axa xwe naterikînim û naçim

Ayşe Kabul di serdema qedexeya derketina derve de ji ber ku mala wê xera bûbû derbasî mala kirê bûbû lê careke din wê mala wê xera bibe û cara 3'emîn wê ji cihê xwe bibe. Mala Ayşeya 60 salî di salên 1990'î de ji ber polîtîkayên koçberiyê 2 caran hatibû şewitandin. Lê Ayşe bi biryar e û dibêje, "Ez ji ser axa xwe naçim tu derê."



Di salên 1990'an de bi polîtîkayên koçberiyê ji nav bajarên ku herî zêde bi bandor bû yek jê Şirnex e. Piştî qedexeya derketina derve Şirnex dîsa bi hilweşandinê rû bi rû ma û 8 kolanên wê hat hilweşandin û li dewsa wê TOKÎ hatin avakirin. Li bajarê ku li her derî û kuçeyên wê çirokên Kurdistanî qewimî ye, Ayşe Kabul a 60 salî 3 caran wê ji cihê xwe bibe. Ayşeyê li hemberî TOKÎ'yan li malek ku ew ê jî wê hilweşandin de dimîne. Ayşeya ku di mala kirê de dimîne dê cara 3'emîn bibe şahidê hilweşandina mala xwe.

### NEÇAR MA JI FEREŞÎNÊ DERKEVE

Ayşeya ku di salên 90'î de mecbûr ma ku ji gundên Feraşînê derkeve wiha behsa çîroka xwe dike: "Em li Feraşînê li gundekî diman. Mala me û ajalên me hebûn. Me amadekariya zivistanê jî kiribû. Piştre di şevekê de gotin hûn ê ji gund derkevin. Em jî mecbûr man ku tiştekî xwe negirin û ji gund derkevin. Piştî ku em derketin malên me xera kirin. Piştre em derketin û em hatin Şirnexê. Dema em hatin Şirnexê cihê ku em lê bimînin tunebû. Her wiha tiştekî ku em bixwin jî tunebû. Me herî dawî çadirek vekir û ez û zarokên xwe li wir man."

### MALA MIN 3 CAR HAT ŞEWITANDIN

Ayşeyê pêvajoya koçberiya xwe ya ku hat duberekirin wiha rave dike: "Me mala xwe û pergala xwe ava kir. Rojekê dîsa me şevekê ji gund derxistin. Demekê em dîsa di kon de man. Piştre min û zarokên xwe me bi hev re malek bi destên xwe ava kir. Dawiyê dewletê got hûn dikarin dîsa vegerin gundê xwe. Em tevî ajalên xwe dîsa vegeriyan gund. Me mala xwe ya li gund dîsa çê kir. Me dîsa pergala xwe ji nû ve ava kir. Tam me got xelas bû dîsa li gund pevçûn dest pê kir. Top avêtin ser me. Me dîsa alav û ajalên xwe li gund hiştin û em hatin vir dîsa."

### EM JI VIR NAÇIN

Di sala 2015'an di serdema qedexeya derketina derve a Şirnexê de mala Ayşeyê dîsa hat hilweşandin. Lê Ayşe koçber nebû û dibêje; "Çi dibe bila bibe ez dev ji Şirnexê bernadim û naçim derekê."
Ayşeyê got: "Dewlet naxwaze ku Kurd li vir bijîn. Naxwaze ku navê gelê Kurd li vir bê bihîstin. Neyartiyê li gelê Kurd dike. Kurd li ku be dibêje ez ê wir xera bikim. Lê çi dibe bila bibe em vir terk nakin. Heger li dijî vê hilweşandinê me berxwe dabe em ê bi her hawî li ber xwe bidin."
…***JINNEWS***

## Ji sedî 75 jin komînê birêve dibe



**Melek DEMÎRTAŞ**

Komîn civakê bi rêxistin dike û kevirê bingehîn yê avakirina Fedraliya Bakurê Sûriyê ye, ji ber ku bingha Netewa Dîmokratîk û nûnertiya azadî, wekhevî û edaletê dike. Her wiha rol û misyona jin di komînê de ya herî çalake, ji ber ji sedî 75 jin komînê birêve dibin. Ev 5 salin ku komîn hatiye avakirin û gelek pirsgirêk çareser kirin û xebat dane meşandin.
Têkîldarê mijarê Hevseroka Komîna Ş.Lewend a taxa Bişêriyê Mêrvet Ibrahîm diyar kir ku komîn sîstemek komînalî ye, yek ji bo herkesî û herkes ji bo yekî di xebite."

### KOMÎTE Bİ ERKÊN XWE RADİBİN

Hevseroka Komîna Ş.Lewend Mêrvet Ibrahîm da zanîn ku ev nêzî salek ser hilbijartina komînan derbasbû, destpêkê me komîtên xwe ku ji 10 komîtan pêk tên çalak kirin, piştre serdna hemû malan kir û civînek giştî ser sîstema nû ya komînan çêkir.
Û wiha pêde çû: "Ku her komîte bi erkên xwe radibin, komîta kar ûbarê civakê û xizmetguzarî belavkirina mazot, xaz, paqijî, taybet alîkariya welatiyên efrînê di milê madî û manewî de. Çi peyda kirina kar û xanî ji wan re. Komîta jin jî her hefte da ku em pirsgirêk û hewcedariyên jin çine ji nêzve bizanibin heftana serdana malan bi taybet malên Efrînê dikin, çi pirsgirêka heyî destpêkê nîqaş dikin û dûra wekî komîteya lihevanîn dikev dewrê û çakreser dikin. Her wiha her hefte carek civînên Hevserok û komîte û ji mehê carekê civîn ji giştî ji taxêre tê lidraxistin. Di civîn rewşa dawî, daxwaziyên gel û pêşniyarên wan tê nîqaş kirin."

### Bİ RÊXİSTİNKİRİNÊ HİŞMENDİYA 5 HEZAR

### SALAN BİŞKÎNİN

Mêrvet diyar kir ku destpêka avakirina komînan rola jin têde kêm bû, lê di piştî hilbijartina di sîstema nû ya Fêdraliyê de rol û misyona jin di komînan ya herê zêde û şalak bû. Mêrvet wiha dom kir: "Wekî komîteya aborî û perwede projeyên wekî perwerdeya durûtinê, tendrustiyê û kowafor bi buhayek pir kêm vekirin. Ji ber ku armanc avakirina derfetên kar û jin ji wê kevneşopiya hişmendiya mêr û car dîwaran derxin, ku ji sedî 75 jin komînê birêve dibin, tevlî bûna jin ji komîn û komîteyan re vê isbat dike. Komîta jin heftana bi renegkî rêxistinî perwerdeyên xweser dibînin û çi mijarên civakî hebe tê nîqaş dikin, da ku jin kesayet, dîrok û hêza xwe nasbike û li gorî wê tevbigere. JIn heya astekê guhertin avakirin, lê pêwîste tekoşîna guhertin û veguhertinê dewam bike, heya ew hişmendiya 5 hezar salan bişkîne."

### KOMÎN NÎŞANEYA WEKHEVİYÊ YE

Hevseroka Komîna Ş.Lewnd Mêrvet Ibrahîm bal kişand ser ku berê civak çawa li komînê meyze dikrin û wiha bi dawî kir:"Destpêkê civak komîn wekî marektekê diditin, lê bi xebatek şînber ketin wê ferqê ku rola komînê civakê bi rengekî komînal û kehevî rêxistin dike. Û herkes bi reng, çand û ola xwe bi rengekî azad cihê têde digre, ji ber komîna nîşaneya jiyana komînal û wekheviyê ye."

## Bi hezaran jin daketin qadan



Li Şerîda Xezayê, di çarçoveya çalakiyan de ku çend meh in dewam dikin, yekem car bi hezaran jin daketin qadan û xwepêşandanek li dar xistin. Di bûyerê de bi dehan kes birîndar bûn.Bi hezaran jin tevî zarokên xwe tevlî çalakiya li herêma sînor ê navbera Xeza û Îsraîlê bûn. Jinan dorpêçiya Îsraîlê şermezar kirin û xwestin, penaberên Fîlîstînî yên piştî sala 1948'an ji cih û warê xwe bûne vegerin ser axa xwe. Jinan bi dehan metreyan xwe nêzî bendên li ser sînor kirin.Di dema xwepêşandanê de hêzên ewlekariyê yên Îsraîlê dest li çalakgeran werdan û herî kêm 17 kes birîndar bûn.Ji rayedarên Wezareta Tenduristiyê ya li Xezayê Aşraf al Qodra got, "xwepêşandêr ji ber guleyên leşkerên Îsraîlê birîndar bûne."Li herêma navbera Şerîda Xezayê û Îsraîlê bi navê "Meşa vegera mezin" 30'ê Adarê çalakiyan dest pê kirin û heta niha herî kêm 138 kes mirine. Tenê di dema barkirina Sefaretxaneya DYA ji bo Qudsê û 14'ê Gulanê salvegera damezrandina Îsraîlê de 62 xwepêşandêr hatibûn kuştin.

## DİJMİNATİYA AKP'Ê LEYLA Û EYLUL DA KUŞTİN

Meclîsa Jinan a HDP'ê got, "Polîtîkayên AKP'ê yên dijminatiya li jin û zarokan, Leyla û Eylul dan kuştin."Meclîsa Jinan a HDP'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand. Di daxuyaniyê de hate gotin, "Ji bo ku rejîma AKP-Qesrê tu tevdîrên parastina mafên zarokan pêk neanîne, bihêlin pêşîlêgirtina windabûna zarokan, êdî pêşî li revandin û kuştina wan jî nayê girtin. Li gorî daneyên TUÎK'ê, di nava 8 salên dawî de bûyerên windabûna zarokan ji 100 hezarî derbas bûne û tenê di navbera salên 2008-2016'an de ji gelheya 16 welatan zêdetir zarok winda bûne."Di daxuyaniyê de berpirsyarê van bûyeran, polîtîkayên hikumetê hat diyarkirin û wiha hat gotin: "Em vê baş dizanin ku; yek ji sedema herî girîng a zarokan bi vê rewşê re rûbirû dihêle, ji perwerdeya paşverû ya li ser civakê didin ferzkirin heta kêmbûna cezayê kesên li ser zarokan îstîsmar dike ye. Ev rewşa ku tê jiyîn rewşên awarteyî nîn in, berovajiyê wê encama hewldanên AKP'ê yên ku dixwaze nifşeke dijminê jinê, zayendîperest biafirîne ye.Em weke Meclîsa Jinan a HDP'ê, dibêjin ku divê tundî û îstîsmara li ser zarokan weke mijareke ser partiyan re bê destgirtin û ji bo peydakirina çareseriyeke ku hemû beşên civak bê tevlîkirin, xebat bên meşandin."

# Ji bo Kurdan tişta pêwîst yekîtî ye

**_Hevseroka Kongra Gel Hacer Zagros diyar kir li hember êrîşan ji bo Kurdan yekîtîya netewî pêwîstiyeke jiyanî û da zanîn ku divê PDK jî helwesta xwe zelal bike._**



Idrîs HENAN

Hacer Zagros diyar kir ku bi hilbijartinên pêşwext yên 24'ê Hezîranê rêjîma Erdogan li dijî Kurdan, hêzên muxalif û demokratîk ku li dora HDP'ê bûbûn yek, têk çû û ya ku dixwest bi dest nexist. Hevseroka Kongra Gel Hacer Zagros hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li Tirkiye û Kurdistanê û her wiha rewşa bakurê Sûriyê û Efrînê ji Rojnameya Ronahî re nirxand.

### HILBIJARTIN DARBEYEK BÛ

Hacer Zagors diyar kir ku Erdogan ji bona ku siyasetên xwe yên înkar, îmha û dagirkirina Efrînê rewa bikin, binxistina HDPê kirin hedef û wiha got, "dixwestin ji dunyayê re bibêjin: "ka binêrin kurdan jî dengên xwe nedan HDP". Ev tişt ji bo wan qederek bû. Ji ber vê yekê derveyî irf û qanûnan di nava du mehan de biryara lidarxistina hilbijartinan dan. Ev biryar li hemberî hêzên demokratîk bi pêşengiya HDP û civaka Tirkiyê darbeyek bû. Lê encamên derketine hemû plan û hesabên Erdogan serûbin kirin."

Hevseroka Kongra Gel Hacer Zagros destnîşan kir ku serketina HDP'ê serketina cebheya demokratîk li Tirkiyê, Kurdistan û Rojhilata Navîn e.

Zagros wiha dewam kir: "Gelê me bi ruhê Berxwedana Serdemê li ser sindoqan hesab ji faşîzma Erdogan xwest. Ev sekna neteweyî ya gelê me ku xwe dispêre paradîgmaya Rêber APO him intîqam û hesabxwestin û him jî yekîtiya neteweyî bû."

Derbarê destekdayîna derve ji Erdogan re Zagros got: "Mayîna wî girêdayî hevsengiyên berjewendiyan a hêzên hegemonîk e. Li hemberî Tevgera Azadiyê û ideolojiya Netewa Demokratîk hîna karê wan bi Erdoganekî teslîmgirtî heye.

Li hemberî itîfaqa wî bi Rûsya re NATO di hilbijartinan de destek dayê. Vê carê ew mecbûre aliyê xwe net bike. Ango merheleya nakokiyên Erdogan bi hêzên globa re dest pê kir."

### GAVA DUYEMÎN PRATÎK E

Di mijara Konferansa Rizgarkirina Efrînê de Hevseroka Kongra Gel Hacer Zagros ev nirxandin kir: "Derketina ji Efrînê li ser esasê parastina gel ji êrîşên navneteweyî bû. Bi qasî me şopandiye, ev konferans xwedî girîngiyek mezin e. Li gorî belgeyên konferansê xuyaye ku aliyên kêm mane, taybet aliyê parastinê "li gorî pîvanên Netewa Demokratîk xwe birêxistinkirin" bi kûrahî hatine nirxandin. Di konferansê de derketiye ku rêveberiya heyî li gorî pîvanên Netewa Demokratîk tevnegeryaye û jiyanek li gorî şer avanekiriye. Li gorî şaxê Netewa Demokratîk ê parastinê gerek bû li Efrînê şerê gel ê şoreşgerî bihata meşandin. Tevî ku gelê me yê Efrînê li kêleka YPG û YPJ heya dawiyê li ber xwe da û bajarê xwe terk nekir, lê dihat xwestin rêveberiyê ji vê baştir jiyana gel li gorî şert û mercên şer bi rêxistin kiribûya. Li gorî wê jî bi qasî me bihîstiye di konferansê de rexnedayîn hatiye dayîn. Niha li holê kantoneke dagirkirî heye. Gel hesabê vê yekê dixwaze. Tenê bi gotinan gel rexnedayînê qebûl nake.

Rexnedayîn gaveke dîrokî û nêzîkbûneke exlaqî ye. Di têkoşîna demokratîk de mekanîzmeyeke bingehîn û çeka esas a pêşketinê ye. Lê belê ev tenê têrê nakê. Gava duyemîn pêwîste pratîk be."

Zagros rêbazên têkoşîna rizgarkirin û vegera Efrînê wiha şîrove kir: "Lazime têkoşîneke siyasî, dîplomasî, leşkerî û civakî bê pêşxistin. Ji bo rizgarkirina Efrînê têkoşînek li ser asta Sûriyeke demokratîk bê kirin. Eger têkoşîneke wiha gihabûya encamê wê Efrîn nehatiba dagirkirin.

### SIBE WÊ TIRKIYÊ BE

Hevseroka Kongra Gel Hacer Zagros di nav nirxandinên xwe de behsa rewşa hevsengiyên muhtemel li Sûriyeyê kir û ev tişt got: "Rewşa li Efrînê qewimiye ji bo Sûriyê û herêmê qonaxeke nû bû. Hat fêmkirin ku nexşeya rê ya hêzên mudexeleker parçekrina Sûriyê ye. Ti insyatîv û projeyekî wan a çareseriya siyasî tune ye. Piştî dagirkirina Efrînê di navbera heman hêzan de nakokiyên kûr rû dane."

Zagros bibîr xist ku hevsengiyên li herêmê ne bi istiqrar in ku êvar û sibeha wan li hev nayê û wiha dewam kir: "Rûsya û Tirkiyê ji bo hinek berjewendiyên demkî hev û din bi kar anîne. Amerîka, Îran û Rûsya qebûl nakin ku dewleta Tirk di herêmê de bibe xwedî hêz û insyatîv. Lê li hemberî modela demokratîk li Sûriyê, Bakurê Sûriyê li Efrînê bi kar anîn. Hêzên hegemonîk xwedî taybetmendiyeke wiha ne ku li hemberî dewletên dîtir hev û din bi kar tînin, piştre jî hev û din tesfiye dikin. çawa ku îro Îran e, sibe wê Tirkiye be.

### KONGREYA NETEWÎ JIYANÎ YE

Hacer Zagros mijara yekîtiya neteweyî û projeyên Kongreya Gel jî wiha nirxand: "Berxwedana Efrînê û dagirkeriya pêk hatiye rewşeke giştî ji bo çar parçeyên Kurdistanê û tevahî herêmê ye. Ji rojên destpêkê ve Kongreya Gel banga piştgiriya berxwedana Efrînê kiriye. Ji ber ku beşên Kurdistanê hev û din bandor dikin, dagirkirina Efrînê dagirkirina tevahî Kurdistanê ye. Gelê me jî banga me bi cih anî û ta vê kêliyê jî piştgiriya berxwedana Efrînê dewam dike. Raste; gelê Efrînê bi vê berxwedanê rabû, lê berxwedaneke neteweyî û navneteweyî ye. Ji ber ku êrîşên li ser Efrînê çêbûne û çêdibin li dijî hemû nirxên mirovî, exlaq û pîvanên demokrasiyê ne. Di qonaxa yekemîn a Berxwedana Serdemê de li ser bangên Rêveberiya Xweser, Tevgera Azadiyê û Kongreya Gel hemû gelên Kurdistan û cîhanê bersiv dan û li Ewrûpayê zêdeyî milyonek mirov daketin qadan. Ev jî bingeheke nû a yekîtî û biratiya gelan e.Hevseroka Kongreya Gel Hacer Zagros di dawiya nirxandinên xwe de ev tişt anî ziman: Piştî dagirkirina Efrînê, êrîşên li ser Bakurê Kurdistanê, hewldanên dagirkirina Başûrê Kurdistanê û avakirina sîstema faşîst li Tirkiyê, gelê me gihaye wê baweriyê ku yekîtiya neteweyî bi qasî av hewayî girîng e. Derveyî hin kesan li tevahî Kurdistanê aliyan helwesta xwe zelal kiriye. Dibêjin ku lidarxistina kongreya neteweyî mijareke jiyanî ye. Em bi hêvî ne aliyên mîna PDK jî di zûtirîn dem de helwesta xwe zelal bikin."

## Dem dema xebatê ye



Tayîp TEMEL

Hilbijartinên 24'ê Haziranê bi dawîbûn lê niqaşên di vê warî de didomin. Civak van encaman rewa nabîne. Bêgûman meseleya me ne tenê hilbijartin e. Em hilbijartinan girîng dibinin lê ji bo me esas nîn in. Lewre kar û barê me nû dest pê dike.

Em rêxistin û tevgerek şoreşger in. Hilbijartin di vê merheleyê tenê ji bo me amurên pêşxistina siyaseta demokratik e. Hilbijartin û encamên wan ji bo me ne armanc in. Armanç, rizgarî û azadiya civakê ye. Di vê warê de armanc civaka rêxistinkiriye. Atmosfera qampanyaya hilbijartinê ji bo vê armancê derfetên mezin û nû afirandin. Me dît ku tenê projeya HDP'ê û felsefeya wî dikare ji derdê civakê re bibe derman. Gel jî HDP'ê û siyesate wî wekî riya çareseriyê dibîne. Vê rastiyê barê me girankir. Lewma em dibêjin derd û kulen civakê çiqas mezinbin barê me jî giran dibe. Lê ev yek bawerî û motivasyona me jî mezin dike. Li çar aliyê Tirkiyê pêwistiya civakê bi rêxistinkirina HDP'ê heye. Em jî ji îro pê de zend û bende xwe hildin, bajar bi bajar, mal bi mal vê rêxistinê mezin bikin. Formûla me hêsan e: Li der derê HDP, li derderê guherîn û azadî.

Bi van encamên bigûman dibe ku hikûmeta AKP'ê ji bo demek din temenê xwe dirêj kiribe. Lê bele rastiya dirokê, helwdana civakê dide nîşan êdî zihniyeta vê rejîmê mefta ye. Temenê xwe zude bidawî kiriye. AKP qeyrana xwe kûr dike. Ji niha ve li pey hev wê zem û buhabûn zêde bibe. Çav berdane nanê gel. AKP di vê qeyranê dixwaze gel bêzar bike. Di nav van şert û mercan de ji niha ve niqaşa hilbijartinên pêşwext yên heremî dan destpêkirin. Di vê warê de çend armancê wan heye.

Civak ji hilbijartinan bêhêvibûne û lewma dixwazin ku vê yeke kûr bikin û bi taybetî dengdarên muxalîf ji sandoqan dûr bixin. Her wiha bi vê riyê dixwazin ku pergala qeyûman rewa bikin. Lê gelê me sondxwariye ku van qeyûman biqewirîne. Gel dê di hilbijartinan de hesaba qeyûman bipirse.

Ji bo me dema hilbijartinan girîng nîne. Dixwazin bila mehek şûn de û dixwazin bila di dema xwe de hilbijartinê heremî li dar bixin. Em bi gele xwe bawerin û amede ne. Ji îro pê de emê xebatên xwe yên siyasî lez bikin. Emê xwe bi rêxistin bikin û bi ser bikevin. Em amedekariya guherîna civakî dikin. Lewma hilbijartin di vê warê de merheleyên pêşketinê ne.

Hilbijartinên heremî bên li darxistin û neyên li darxistin jî em tu car hêviya gel vala dernaxin. Em yekemîn alternatîfa vê civakê ne û em ê li gor vê rastiyê tevbigerin. Xebatên me yê parlamentoyê jî dê li ser vê esasê teşebigrin. Emê performansa wekî ku em partiya muxalîf ya bingehîn in emê bimeşinin.

Civaka Tirkiyeyê di hilbijartinê 24'ê Haziranê de tifaqa xwe li dar xist. Di vê warê de xwedî li rihê HDP'ê xwedî derket. Ji bo me siyaseta sereke, berfirehkirina vê tifaqa civakî ye. Em behsa tifaqên formel ên di navbera partî û saziyan de nakin. Di vê warê muxatabê vê tifaqê beşên civakê bi xwe ne. Ewil tifaqa kurd û pişt re jî tifaqa gelên Tirkiyeyê… Kes nikare pêşiya vê yeke bigre û encama herî mezin ya van hilbijartinan jî ev yek e. Bingeha vê tifaqê hatiye avakirin û niha tişta dikeve ser milê me ewe ku em pêşiya vê daxwaza civakî bikin.

## Xetereya bi darvekirina Ramîn hê didome



Bertek û nerazîbûnên li dijî cezayê darvekirina siyasetmedarê kurd Ramîn Hisên Penahî dirome. Rêxistina Amnesty International nameyek ji bo betalkirina biryara darvekirina ciwanê Kurd Penah ji hikûmeta Îranê re şandibûn û xwestibûn ku hikûmet vê biryarê betal bikin. Di nameyê de îmzeya 33 hezar û 356 welatiyên Norwêcî têde cih girtibû. Piştre zêdetirî 2 hezar welatiyên medenî û mafê mirovan nameyek îmze kirin û xwestin cezayê darvekirinê yê Ramîn bê betalkirin. Parêzerê Ramîn, Hisên Ehmed Niyaz diyarkiribû ku daxwaza ji nûve destgirtina dosyaya Ramîn, ji aliyê Dîwana Bilind a Welêt ve hatiye red kirin. Birayê Ramîn, Ehmed Hisên Penahî jî vê agahiyê piştrast kiribû. Parêzerê Ramîn Hisên Penahî Huseyin Ehmedi Niyaz têkildarî rewşa Penahî agahî da û wiha got: "Dibe ku hasasiyeta civakê çê bûbe. Lê hêj muwekilê min di bin rîska cezayê înfazê de dijî. Dibe ku ez roja yekşemê li Girtîgeha Navendî ya Senendic (Sine) Penahî ziyaret bikim. Muwekilê min Penahî di bin çavan de rastî îşkenceyê hatibû. Ji ber îşkenceyê gurçika wî enfeksiyon girtibû. Bijîşkê girtîgehê di hizûra min û Ramin de rapora dermankirinê pêşkêş kiribû. Lê hêj nehatiye dermankirin. Li gorî Zagona Ceza ya Sîne, divê bi nivîsek fermî Ramîn li nexweşxaneyek taybet bê razandin. Lê tevî bijîşk rapor şand jî heta niha tu encam nehatiye bi dest xistin."

Prz. Niyaz, herî dawî da zanîn ku her çend eleqe û hasasiyeta cemaweriyê çêbû jî her dem rîska cezayê Penahî têxin meriyetê heye. Niyaz, da zanîn ku mafê hevdîtina parêzer jî ji destê wan hatiye girtin.

## KENY ji bo başûrê rojava yê Sûriyê dicive

Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî (KENY) ku xwe li ber dagirkirina Efrînê kerr kiriye, wê îro li ser şerê li başûrê rojava yê Sûriyê bi rengekî lezgîn bicive.

Civîna lezgîn bi daxwaza endamên demkî yên KENY Swêd û Kûweytê pêk tê. Hate ragihandin ku di civînê de wê operasyonên rejîmê yên li wîlayeta Deraayê bên nirxandin.

Operasyona rejîma Sûriyê ku bi desteka Rûsyayê dest pê kir, du hefte li pey xwe hişt. Tê gotin ku ji ber operasyonê nêzî 300 hezar sivîl ji cih û warê xwe bûne.

Hate ragihandin ku Urdunê destûr nedaye ku sivîlên reviyan e xwe li wan bigire û bi hezaran sivîlan berê xwe dane Girên Golanê ku di kontrola Îsraîlê de ne.



# Barzanî li gor dîroka xwe tevdigere

**_PDK û Berzanî dîsa di vê demê de li gor dîroka xwe ya bê oxir û dij berjewendiyên gelê Kurd tevdigere. Nêçîrvan Barzanî ku serokê rêjîma Tirk Erdoganê faşîst ji ber hilbijartinan pîroz kir, PKK jî weke dagirker bi nav kir._**



Serokwezîrê Herêma Kurdistana Federal Nêçirvan Barzanî bi rêya telefonê li Serokkomarê Tirk Recep Tayyîp Erdogan geriya û ew pîroz kir. Barzanî PKK jî bi 'dagirkeriyê' sûcdar kir.

Nêçirvan Barzanî piştî hilbijartinên 24'ê Hezîranê yên li Tirkiyê bi rêya telefonê li Serokkomarê Tirk Erdogan geriya û ew pîroz kir.

Barzanî li ser êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk ên li ser axa Başûrê Kurdistanê axivî û got, "Hem ji ber operasyonên Tirkiyê, hem jî ji ber yên hinekî din, carna gelê sivîl dibe qurban. Ji ber vê yekê em bi guman in." Barzanî bi vê gotinê qebûl kir ku sivîl tên kuştin.

Rêveberiya Hewlêrê heta niha timî li ber komkujiyên dewleta Tirk ên li ser sivîlan bêdeng ma. Dewleta Tirk ev çend meh in gelek herêm bi rengekî leşkerî dagir kiriye. Hêzên dagirker bi awayekî bê navber bomberdûmanê li cih û warê sivîlan dikin.

Tevî vê yekê jî Barzanî rabû PKK sûcdar kir û got, "PKK'ê beşeke mezin a Herêma Kurdistanê dagir kiriye û ji vê derê êrîşê dibe ser Tirkiyê."

Barzanî got, "Em li dijî vê yekê ne. Em li dij in ku ji herêma Kurdistanê êrîş li Îranê û Tirkiyê bê kirin." Barzanî di axaftina xwe de gotinek jî li dijî dagirkeriya dewleta Tirk negot.Nêçirvan Barzanî li ser Partiya Demokrat a Kurdistanê li Îranê (ÎKDP) û rêxistina Komala jî axivî.

Barzanî ev îdîa kir: "Me gelek caran ji komên mûxalîf ên Îranê û PKK'ê xwest ku ji nava axa Herêma Kurdistanê êrîşê nekin. Ya ku tê kirin yekalî nîne. Divê gel bi vê zanibe."

## Piştgirî ji bo azadiya Ocalan mezin dibe




Sendîkaya PROSPECT a Îngilîstanê ku zanyar, hunermend û endezyar endamên wê ne, tevlî .kampanya ji bo azadiya Ocalan bû hezar endamên sendîkaya 183 PROSPECT hene. Endamên sendîkayê li karên çandinî, weşana radyoyê, parastin, perwerde, servîsên zarokan, enerjî, hawirdor, mîrateya çandî, deryayî, Telekom û ragihandinê dixebitin. Sendîka ku li zêdeyî 600 branşên li sektorên bingehîn xwe bi rêxistin kiriye, li gelemperiya Îngilîstanê .personelên xwe hene

Sendîkaya ku navenda wê li paytext Londonê ye, hefteya bihurî desteya xwe ya rêveber li hev civand û biryar da ku destekê bide kampanya "Freedom for Ocalan". Sendîkaya PROSPECT mîna sendîkaya USDAW'ê bi giranî tevlî kampanyayên piştevaniyê yên navneteweyî nabe. Lê belê her du sendîka ji bo azadiya Ocalan tevlî .kampanyayê bûn

Kampanya "Freedom for Ocalan" beriya niha bi du salan li Brîtanyayê dest pê kir û niha bi desteka sendîkayên girîng didome. Kampanya "Freedom for Ocalan" bûye yek ji mezintirîn kampanyayên ku li Îngilîstanê tê meşandin û ji aliyê sendîka û rêxistinên ku temsîla bi milyonan .kesî dikin, tê birêvebirin

Kampanya, ji aliyê Sendîkaya Unite the Union û Sendîkaya Kar a Giştî (GMB) ve sala 2016'an li Kamara Avamê bi daxuyaniyeke çapemeniyê dest pê kiribû. Unite the Union sendîkaya herî mezin a li Îngilîstanê û Gallerê ye û 1,5 milyon endamên xwe hene. GMB'ê jî .800 hezar endamên xwe hene

Konfederasyona Sendîkayên Brîtanyayê (TUC) ku zêdeyî 6 milyon endamên xwe hene, guh dabû banga sendîkayên xwe û di kongreya xwe ya par de biryar dabû ku ji bo azadiya Ocalan bi rengekî aktîf .bixebite

Her wiha Thompsons Solicitors ku 750 parêzer endamên wê ne, piştgiriyeke xurt dabû kampanya ji .bo azadiya Ocalan

Wekî din, mezintirîn festîvala karkeran a cîhanê "Durham Miners Gala" ku 14-16'ê Tîrmehê wê bê kirin, diyarî Ocalan hate kirin. Tê payin ku zêdeyî 200 hezar kes tevlî festîvalê bibin. Festîvala "Durham Miners Gala" 134 sal in bi rengekî bê navber li Brîtanya Mezin tê .lidarxistin

## LI ŞEHBAYÊ CIVÎNÊN BI GEL RE BI DAWÎ BÛN



Delegeyên Konferansa Rizgarkirina Efrînê civînên ku li Şehba ji bo gelê .Efrînê lidardixstin bi dawî kirin

Li navçeya Fafîn a kantona Şehba delegeyên Konferansa Rizgarkirina Efrînê encama Konferansa Rizgarkirina Efrînê bi gel re parvekirin û bi dehan şêniyên Efrînê .tevlî civînê bibûn

Delegeya konferansê Fatma Mihemed daxuyaniya dawî ya konferansê xwend. Hevserokê Meclîsa kantona Efrînê Mustefa Hesen jî axivî û got:"Em Efrînê ji dewleta Tirk û çeteyên wê re nahêlin û têkoşîna me ya rizgarkiri-".na Efrînê didome

Hesen di nava gotinên xwe de anî ziman ku wan rewşa Efrînê ji hemû aliyan ve nirxandine û rizgarkirina .Efrînê nîqaşkirine

Her wiha delegeyên konferansê li pêşiya gel rexnedayîna xwe dan û gel jî di nirxandinên xwe de nêrîn û pêşniyarên xwe ji bo rizgarkirina Efrînê anîn ziman…*ANHA*

## Çalakvana Kurd radestî dewleta Tirk hat kirin





Siyasetmedara Kurd Gulîzar Taşdemîr ku ji bo penaberiya siyasî serî li Norwêcê dabû û derman .dibû, radestî Tirkiyê hate kirin

Gulîzar Taşdemîr ku nêzî 27 salan di nava têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd de bi awayekî çalak cih girt, 7'ê Hezîrana 2015'an li Norwêcê ji bo penaberiya siyasî serlêdan kiribû. Taşdemîr a ku bi nexweşiyeke giran e, li gel helwestan û şertên zextê yên faşîst ên Tirkiyê jî hate dersînorkirin. Diyar bû ku îro hatiye .dersînorkirin

Ev dersînorkirina li Tirkiyê, ku mafê mirovan, azadî û hiqûq lê rabûye, ji bo mafê penaberan rewşeke nû û .metirsî destnîşan dike

Taşdemîr, sala 2015'an piştî ku serî li Norwêcê dabû serlêdana wê nehatibû qebûlkirin. Taşdemîr li ser vê yekê îltîcayî Elmanya kiribû. Vê carê jî bi hinceta peymana Dûblînê ew .dabûn Norwêcê

Tevgera Jinên Kurd a li Ewropayê (TJK-E) beriya ku Taşdemîr were dersînorkirin bi daxuyaniyekê gotibû, "Tê xwestin ku Taşdemîr bikin qurbana yasayan." TJK-E'yê xwestibû ku Taşdemîr neyê dersînorkirin û wiha gotibû, "Li Tirkiyê hê jî Rewşa Awarte heye. Li Tirkiyê, di rejîma yekdestî de ewlehiya jiyanê ya mirovên ne xwedî nasnameyên siyasî jî nemaye. Diyar e ku ewlehiya jiyanê ya Taşdemîr, ku bi nasna-".meya siyasî tê naskirin, tine ye

## Fîlma Reîs dest pê kir



Mihemed ŞAHÎN

Piştî fragmana du salan bi bangewaziya Suleyman Soylu fîlma esasî dest pêkir. Ji 15'ê tîrmeha 2016'an vir ve em fragmana fîlma deshilatdariya yek kesî ya tirsnak temaşe dikin. Eniya muxalîf hewldida ku bi serkeftina xwe ya hilbijartinan wê fîlmê bi gel nede temaşekirin. Mixabin muxalefet biserneket û bi bangewaziya fîguranekî film zû dest pêkir.

Encamên hilbijartinan yên fermî eşkere nebûne, meclîs kom nebûye û dest bi kar nekiriye, serokomar sûnd nexwariye, wezîrên xwe diyar nekirine û dest bi kar nekirine. Wezîrê karê hundir Suleyman Soylu bi lez û bez fîlma tirsnak a ku dê Tirkiyê roj bi roj ber bi tarîstana dojehê ve bibe da destpêkirin. Gelek caran fîlmên tirsnak li Tirkiyê, bi taybet li Kurdistanê hatin kişandin. Ji vana ya herî girîng yek di salên 90'de li Kurdistanê hate kişandin. Serkêşên fîlma salên 90'î Tansû Çiler, Mehmet Ağar, Dogan Gureş û hevalbendên xwe niha li rex Erdogan in û bi cerebeyên xwe hêz didin Erdogan. Wisa xwiya dike ku Erdogan dixwaze ji fîlmên berê bêtir fîlmeke reş û tarî û bi tirs û xof bikşîne. Lewre, bi ser mexdûra salên 90'î birêz Pervîn Buldan re dest pêkirina fîlma nû neteseduf e.

Di destpêka fîlmê de Şagirtê salên 90'î wezîrê karê hundir telefonê dide hevseroka partiya sêyemîn a Tirkiyê ya ku 6 milyon kesî temsîl dike û jêre dibêje "ji bo we êdî mafê jiyanê tune ye". Ferman dide waliyên xwe û tevilbûna merasîma "şehîdan" a endamên partiya duyemîna ku 12 milyonî temsîl dike qedexe dike. Eşkere û bê fikar herdû pertiyên muxalîfên ku 20 milyon kesî temsîl dikin tehdît dike. Serokê partiya nîjadperest lîsteya 70 rojnamegerên muxalîf eşkere dike û li wan gefan dixwe. Serçeteyê dest bixwînê ku bi salane di zîndanê de ye 6 rojnamegeran bi kuştinê tehdît dike.

Geşedanên destpêka fîlmê asta tirsnakbûna fîlmê bi me dide fêmkirin. Di fîlma nû de dewlet ji pergala komarê derbasê pergala Reîs dibe. Di pergala Reîs de Ser Reîs heye û di bin wî de Reîsok hene. Di pergala Reîs de ji bo biryar bi lezûbez bikevin meriyetê rêgezên mafya derbasdarin. Reîs û Reîsok him dozger, him dadger û him jî mubaşîr in. Di pergala Rêîs de pêdivî bi têgehên gerdûnî yên weke heq, hiqûq, edalet, makezagon, wekhevî, aştî, aramî, nirx, pîvan, rûmet, demokrasî tune ye. Tenê pîvanên Reîs û Reîsokan hene û li gorî pîvanên wan "racon" heye.

Di pergala Reîs de ji bo civaka Kurd, ji bo partiyên muxalîf, ji bo saziyên muxalîf, ji bo kesên muxalîf û ji bo çapemeniya muxalîf mafê jiyanê tune ye. Mafê jiyanê tenê dibin sîwana Reîs de heye. Meclîs bêwateye, dadmendî di bin fermana Reîs de ji bo tasfiyekirina civaka Kurd û muxalîfan hey e.

Di pergala Reîs de şer, kuştin, dagirkerî, talan , wêran, penaberî û desteserkirina dewlemendî û îradeya gel heye. Kûrbûna nakokiyan û dijberbûna civakan heye.

Di pergala Reîs de ber bi Yekbûna Ewropayê ve, ber bi nirx û pîvanên demokrasiyê ve, ber bi exlaq û rûmetên mirovahiyê ve meş tune ye. Ber bi reştarîya dojehêve meşeke nebixêr hey e.Bêguman civaka Kurd nebiyaniyê van fîlma ye. Gelek caran fîlmên wisa tirsnak temaşe kirine û nehiştine fîlm li gorî dilê derhinêr bi dawî bibin. Lê civaka Tirk dê cara yekem temaşe bike. Em dizanin ku di dawiya şevê de, piştî tariya herî reş û dijwar de Roj dibişkive.